



Firamerz Kaşifi

“Sê birayên min çûne ber rehmêtê, rondik ji çavên min nehartin xwar, lê ji boy Dr. Qasimlo min bi dilek şewitî pirr rondik barandin.” ...»8

Hedasa Yeşurun :
Dema bi kurdî stran-an dibêjim hêstiran di çavên wan de dibînim ...»10



Bidestveanîna mafên netewî yê gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

AGIRÎ

ENKS'ê biryar da ku ji dijberên din ên Sûriyê veqete

Serkirdeyên Encûmena Nîştimaniya Sûriyê biryar dan ku serbixwe kar bikin û li derveyî hevalbendiya dijberên Sûriyê kar bikin. ENKS'ê roja 18'ê Tebaxê biryar da ku bi awayeke serbixwe û li derveyî encûmena 114 kesî ya hevalbendiya dijberan de kar û çalakîyên xwe bimeşînin, jiber ku wan daxwazên Kurdan qebûl nekirine.

Duheftnameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (212) 22-08.2013 Buha (150) Tûmen



Qasimlo bîrmend û rêberê PDKÎ ...»5

Tu hêzek nikare îradeya tekoşerên demokrat lawaz bike

Li binkeya Deftera Siyasî ya LPDKÎ rêz ji 52'ê Gelawêj hat girtin

Bi hinceta 25'ê Gelawêj, salvegera damezrandina PDKÎ rêûresmek li binkeya Deftera Siyasî li bajarê Koyê birêve çû.

Rêûresm roja Înê 25'ê Gelawêj bi beşdariya endamên rêberî û pêşmerge û malbat û endamên PDKÎ û herwusa nûnerên dezgeha ragehandinê, partiyên siyasî û mêhvanên hêja birêve çû.

Despêka rêûresmê bi xwendina sirûda Ey Reqîb û ragirtina deqeyekê bêdengî bo rêzgirtin ji riha paqij a şehîdên kurdistanê dest pêkir.

Piştê 68 kes ji pêşmerge û malbatên wan (jin û mêr) ên PDKÎ, bi nîşaneya rêzgirtin ji xebat û tekoşin û hewusa bi nîşaneya wefadarî bi rêbaza demokrat ku alaya kurdistanê di destê wan de bû, bangî ser dikê hatin kirin.

Piştê Mihemednezîf Qadirî



endamê Deftera Siyasî a PDKÎ bi boneya vê rojê gotinek pêşkeş kir.

Di beşek din a vê rêûresmê de sirûdek bi navê “Bijî demokrat” ji aliyê kora mozîkê ya PDKÎ ve hat pêşkêşkirin, û paşan peyama hevpar a yekîtiya Jinan, Lawan û xwendekarên demokrat ên Kurdistanê ji aliyê Kinêr Mêhfer

ve hat pêşkêşkirin.

Pexşana Rêjge Behramî û hejmarek ji sitranên filklor di beşa din a rê û resmê de hatin pêşkêşkirin û bi govend û dîlana Kurdî rê û resm bi dawî hat. Deqê axavtina rêzdar Mihemednezîf Qadirî di rûpelên 3 û 4'ê de bixwînin.



Foad Xakîbêyî:
“YCDKÎ mil bi milê tevgera xelkê Kurdistanê xebatê dike” ...»9



Ev her du xûşk hîn jî dijîn ...»7



Rojnameya Agirî di malpera Agirimedia.org, û Kurdistanmedia.com de bixwînin.



Yek helwestî hewcehiyek dîrokî û erkek neteweyî ...»7

Sergotar

68 sal can- gorîti

Şehab Xalidî

Şêst û heşt sal berî niha bû ku PDKÎ bi hewl û tekoşîna Pêşewa Qazî Mihemed hate avakirin û her vê partiye jî karî ku piştî Komara Kurdistanê ava bike û vê şanazyê bo heta heta di nav rûpelên xwe ên zêrîn de bixemilîne.

Piştî rûxandina Komra Kurdistanê jî vê partiye di rewşên herî bi zehmet de berxwe da, li ser piyên xwe sekinî û bo mana xwe û li hember wergirtina alîkariyên maddî û siyasî de, çî poan li ser bingeha dijminatîya bi aliyek din re neda tu rêkxiraw, partî yan heta dewletekê jî.

Serbixweyiya PDKÎ ji şanazyên herî bi nirz û sermayeya herî mezin ya PDKÎ ye, û di rastî de PDKÎ bi vê serbixweyiya xwe ya siyasî zêdetir tê nasîn.

Ew serbixweyiya ku şehîd Dr. Qasimlo nixê giran jî jêre dan da ku îro nivşên niha şanazyê pê bikin, û bizanin ku ew partiya dikare nûner û pêşengê wan yê rastîn be.

PDKÎ yek ji wan kême partiyan e ku herçend dijmin karî bi îxanet û bi xapandin û terorê rêberên wê ji nav bibe, lê jiber ku toyê rêberiya bi kom têde hatiye çandin, û weha li ser destê rêberên xwe hatiye perwerde kirin ku di her rewşekê de bikare xwe bi rêve bibe, û biryarên siyasî tenê di destên kesekî de nebe, lewra dîsan jî yek bi yek xewn û xeyalên dijmin kirne bilaqa ser avê, û pûç kirin, û rûreşî bo neyaran bi cih hêla.

Em dikarin bêjin ku PDKÎ partiya pêşeng, xwedî cerbandinên zaf, xwedî pêgeh di nav xelkê Kurdistanê û naskirî di astê navneteweyî de ye. Lewra xelkê Kurdistanê şanazyê bi vê partiya xwe dike û heta ew mabin wê PDKÎ jî, her bi vî awayî bi hêz di qada xebat û tekoşînê de bimîne, û wê bikare wek berê cîyê hêviya xelkê Kurdistanê bo pêşerojê geş û ronahî be.

Şandeke PDKÎ bi serperestiya birêz Mistefa Hicrî seredana kesayetiye naskirî ye kurd Îzedîn Mistefa Resûl kir

Li gor nûçeya Kurdistanmedia, **L**seredan piştî nivroya roja Şemî 22'ê gelawêja 1392'ê (13'ê Tebaxê) ji aliyê şanda PDKÎ ve hat encamdan û rêzdar Mistefa Hicrî rewşa saxlemiya rêzdar Îzedîn Mistefaresûl pirsî.

Rêzdar Dr. Îzedîn Mistefa Resûl hevalek kevnare PDKÎ ye û hertim tevî tekoşerên vê partiye, di xweşî û nexweşiyên de beşdar bûye û xwediyê helwestek bilind a netewî ye.



Birêz Mistefa Hicrî beşdarî di serxweşiya Şêrko Bêkes de kir



Kurdistanmedia: Heyetek PDKÎ bi serperestiya rêzdar Mistefa Hicrî sekretêrê giştî yê PDKÎ, li bajarê Silêmaniyê beşdarî di sersaxiya hozanvanê bi navûdengê gelê me Mamosta Şêrko Bêkes de kir.

Li gor nûçegehaniyan, roja Sêşemî 22'ê Gelawêja 1392'an (12'ê Tebaxê) şanda PDKÎ beşdarî sersaxiya Şêrko Bêkes bû, Sekretêrê PDKÎ hevxemiya xwe û PDKÎ gihîjande heval û malbata Mamosta Şêrko Bêkes. Malbata Şêrko Bêkes, sipas û pêzanîna ji helwesta PDKÎ û beşdariya PDKÎ di sersaxiyê de kir.

Hewceyî gotinê ye ku roja yekşemî 13'ê Gelawêjê (14'ê Tebaxê) mamosta û hozanvanê niştimanperwer ê kurd Şêrko Bêkes bi sedema nexweşiya penceşêra qirikê li nexweşxaneyêke bajarê Stîholmê ya welatê Swîdê û di bin çavdêriya nojdarên de malawayî ji jiyandê kir.

Roja duşemî 21 Gelawêjê (13'ê Tebaxê) termê Mamosta Şêrko Bêkes ji rêya frokexaneyê gihîştê bajarê Hewlêrê û pişt re gihîjandine bajarê Silêmaniyê û di rûuresmekê de, diparka Azadiyê ya vî bajar de hat veşartin.

Peyama PSK bo PDKÎ bi bona 25'ê Gelawejê



Ji Bo Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Hevalên hêja û tekoşer,

Em bi bona 25'ê Gelawej, roja demezrandina partiya we ya xebatger, pîrozbahiya xwe pêşkeşê we û bi rêka we ve pêşkeşî hemû endam û alîgirên partiya we dikin.

Piştirast in, xebata Partiya Şehîd Pêşawa, Qasimlo, Dr. Seîd, Partiya ku xwediyê tecrubeyên xebat û berxwedan û cangoriya 68 salî ye, wê serkeve.

Em bi xebat û tekoşîna we, bi dostanî û biratiya PSK û PDKÎ serbilind in.

Bijî 25'e Gelawej solroja damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê! Serkeve Xebata Partiya Demokrat a Kurdistanê ji bona bi dest xistina mafên netewî û demokratîk yên gelê Kurd li Kurdistanê Rojhilatê!

15 Tebax 2013
Komîteya Navendî ya
Partiya Sosyalîst a Kurdistanê

Deqê axavtina birêz Mihemednezîf Qadirî bi boneya 25'ê Gelawejê salvegera avakirina PDKÎ

Hemwelatiyên hêja!
Xûşk û birayên rêzdare!
Beşdearbûyîyên hêja!
Gellek bi xêr bèn

Îro em li vir li hev civiyane da ku carek din li 25'ê Gelawej 68'emîn salvegera avakirina PDKÎ partiya hezkirî ya civatên xelkê Kurdistanê û stêrka bi çirûk ya tevgera netewî demokratîk a gelê Kurd hurmetê bigrin û avrûyekê bidne xebat û tekoşîna vê partiya hezkirî. Di vê roja dîrokî û boneya neteweyî de ji aliyê Deftera Siyasî a PDKÎ ve em germtirîn pîrozbahiyê dibêje gelê Kurd malbatên serbilinde şehîdan, girtiyên siyasî û endam û alîgirên partiya xwe ya tekoşer, û silavên emegdarî û hezkirinê bişînin bo canê pak yê Pêşewa Qazîmihemed û tewaye wan tekoşerên ku bo domandina vê rêbazê canê xwe gorî kirine.

Xûşk û birayên hêja!

Di 25'ê Gelawêja sala 1324'an a Rojî de (16'ê Tebaxa 1945) piştî sê sal xebata siyasî û rêkxiraweyî Komeleya J- K, xortên tekoşer ên Kurd bi rêbertiya Qazî Mihemed bi lêkdaneweyek siyasî li ser rewşa siyasî ya Îran û Kurd, bi taybetî piştî vê rewşa siyasî ku li serdemê şerê duyemîn ê cihanî de ku Îran û Kurdistan bi xwe ve girtibû, bi xwendinek modern û cîhanbîniyeke nû ve, bi pêanîna PDKÎ, Tevera Kurd xiste ser rêbazeke nû, û rêberiyek bi kom û bernamaya siyasî ya PDKÎ li heşt xalan de pêşkeşî xelkê Kurdistanê kirin. Avakirina PDKÎ bû sedema pêşwaziya xortên welatperwer ên Kurd di raserî Kurdistanê Îranê ji Makû ve bigre heya Îlamê. Ji bilî vê peyama PDKÎ hemû parçeyên Kurdistanê Îranê girt, û destê destê xortên welatperwer ên Kurd ji parên din ên Kurdistanê pêwendî bi PDKÎ re kirin û piştevaniya xwe ji vê partiya pêşkevtî û neteweyî eşkere kirin.

Xûşk û birayên birêz!

Bandora Qazî Mihemed li ser tevgera niştimanî a Kurdistanê û geşandina xebata rêkxiraweyî ya PDKÎ, rewşek bi cî bo gihîştina gelê Kurd bi armancên ji mêjîn ênxwe pêk anî. Lewra Qazî Mihemed ji vê derfetê mifah wergirt



û li gorî bernameyek siyasî li 2'ê Rêbendana 1324 (1946), Komara Kurdistanê wek yekem deskevta siyasî ya PDKÎ û gelê Kurd ragehand. Bi vî awayî gelê Kurd di beşeke Kurdistanê de gihande armancên wê ên pîroz. Deskevtek din a PDKÎ ku mînaka pêşkevîyê bi taybetî di wê serdemê de bû, avakiirna rêkxirawên pişeyî ên wek Yekîtiya Ciwanan û Jinan wek berhemê vê dîtingeha civakî bûn. Piştî rûxandina Komara Kurdistanê jî PDKÎ bo domandina xebatê û bi destveanîna armancên PDKÎ rêkxirawên xwe bona xebata dijî rejîma paşatîyê ser ji nû ve rêkxist û li çendîn qonaxên dîrokî de şiya ku rolê xwe ê şoreşgerî bilîze. Beşdariya di gera 17'ê ya Meclîsa Şoraya Millî ya Îranê û serkevîna berbijarê PDKÎ li bajarê Mehabadê, di sala 1331'an (1952) û piştevnî û rêberîkirina serhildana melbenda Mokiryan bi dijî feodalan û destpêkirina xebata çekdarî ya salên 1346 - 1347'an û ji hemiyê giringtir lêkdaneweya jîrane ya PDKÎ û bi taybetî şirovekirina wan bûyeran ji aliyê rêberê mezin Dr. Qasimlo ve li destpêka meş û serhildanên xelkê Îranê dijî rejîma Paşatîyê û danîna Komîteya Zagros ji tekoşerên PDKÎ bi armancê rêberîkirina xwepêşandanên xelkê Kurdistanê mînaka pêdagirbûna PDKÎ li ser beşdariya di tevgera azadîxwaziyê li Kurdistanê Îranê de ye.

Beşdearbûyîyên hêja!

Piştî serkevîna şoreşa bi coş ya gelên Îranê û piştî vê hemû berxwedana PDKÎ û gelê Kurd rêberên olî ên taze bi deshilat gihîştî ên Îranê bi mifahwergirtina ji hesta

ayînî ya xelkê rêbaza vê şoreşa mezin ku berhema serhildan û xwîn û xebata dehan hezar kesî ji xortên azadîxwaz ên welatê me bû, ji rîya xwe derxist, û carek din civatên serhildêr ên têhniyê azadiyê di gel rejîmek dîktator û zordartir ji rejîma pêşîn kir.

Di destpêka vê siyasîyê de PDKÎ yek ji wan aliyên siyasî bû ku hest bi vê metersiyê kir û li gel partî û aliyên siyasî ên pêşkevînxwaz ên Îranê ketne diyalog û bîrûra guherînan, bona vê ku bi platformeke siyasî bikarin rejîmeke demokratîk binne ser kar, lê mixabin bi sedema ne hevahengiya siyasî û berhevdana bi şaş ya beşek ji wan aliyên siyasî, rêberên olî ji vê valahiyê mifah sitandin û li bi nav refrandomekê de rejîma Komara Îslamî bi ser xelkê de sepandin. Lê PDKÎ helwesta xwe ya dîrokî girt û di vê bi nav refrandomê de beşdarî nekir û bê bingejbûna vê rejîmê eşkere kir. Rêberên rejîma Komara Slamî ya Îranê ku ji pêgeha cemawerî ya PDKÎ, û bandora siyasî li ser tevgera mafxwazane ya gelên Îranê û banga demokrasîxwaziya PDKÎ di astê sertaserî de wek tehlûkeyekê li ser siyasîyê ne demokratîk ên xwe de dizanîn, gellek zû dest bi darêtina pîlanan bi dijî PDKÎ kirin, lewra çendîn şerên bi xwîn li Kurdistanê de dest pêkirin, û herweha bi pêkanîna şerê bi xwîn ê bajarê Pawe, Xomênî biryara êrîşa sertaserî û fetwaya cîhadê bi dijî gelê Kurd da, û PDKÎ jî hîloşandî ragehand û tewaye hewlên rêberên Kurd bona çareserîya aştiyane ya pîrsa Kurd ji nav bir.

Dom R: 4

Xûşk û birayên birêz!

Li hemberî vê siyaseta dijî mirovî de PDKÎ biryara berxwedanî û berevanîkirna ji mafên gelê Kurd da. Ji vê demê pêve heya niha xebateke pirr ji berxwedan û qurbanîdan di holê de ye û bi hezaran kes ji xelkê Kurdistanê û endam û kadr û pêşmergeyên qehreman ên Kurdistanê û rêberên jêhatî ên partiya me ya tekoşer canê xwe di riya armancên pîroz ên gelê Kurd de gorî kirine û bi xwîna xwe rewayiya vê xebatê selimandine.

Rêzdarno!

Em 68'mîn rêûresma partiya xwe ya tekoşer di demekê de digrin, ku tevgera mafxwaziya gelê Kurd di tev parên Kurdistanê li geşandinê de ye û berev aliyekê pêngavean hildigre ku gelê Kurd bibe xwediyê şûnas û serweriya neteweyî. Li başûrê Kurdistanê Hikumeta Herêma Kurdistanê kariye ku li warê siyasî û dîplomasiyê û pêwendiyên navdewletî pirsra Kurd li Îraqê bike yek ji faktêrên sereke ên herêmê. Li bakûra Kurdiostanê tevgera medenî û cemawerî a Kurd rû li geşekirinê ye û gihaye qonaxeke hestiyar di navbera delweta Turkiye û serokê PKK'ê. Gotûbêj dest pêkiriye, û em hêvîdar in ku ew pêvajoya armancên neteweyî ên gelê Kurd di vê para Kurdistanê de bi des bixe. Pirsra Kurd li Sûriyê jî niha yek ji pirsên siyasî ên herêmê ye, û ew para xaka Kurdistanê di rewşek hestiyar re derbas dibe. PDKÎ li ser vê baweriyê ye ku parastina herêmên azadkirî û deskevtên Kurd di rojavayê Kurdistanê de tenê û tenê bi yekrêzî û yekîtiya di navbera tev aliyên Kurd di vê beşa Kurdistanê de bidestve tê û armancên gelê Kurd dipêke. Ew tehlûkeya aliyên tundrew ên Erebi û Îslamî ku bûne gef li ser deskevtên gelê Kurd û jiyana xelkê medenî pûç dike. Em tevî piştewaniya ji xebata gelê Kurd di Kurdistana Rojava, em kiryara vê aliyê cîhadî û dijî Kurd ku êrîşî ser akinciyên vê beşê dikin şermezar dikin, û daxwazê ji aliyên mirovdost dikin ku bi hawara wan de herin.

Di Kurditana Îranê de jî serbarê bi çok de anîna gelê Kurd û partiyên wê ên şoreşger, xebat her berdewam e û PDKÎ bi girtine pêşê a helwestên siyasî ên di cihê xwe de û mifah sitandina ji tev metodên xebatê û hilbijartina taktîkên li gorî rewşa siyasî welatê me û



Kurdistanê pêngavan diavêje.

Rêzdarno!

Ji vê dîtingehê ve ku niha pirsra Kurd yek ji pirsên giring ên Rojhilata Navîn e, û faktêrê berçav di piroseya siyasî ya herêmê de ye, ew rewşa nû bo serkirdayetiya siyasî ya Kurd derfeteke dîrokî ye bo Kongireya Neteweyî a Kurd. PDKÎ bi dirêjahiya temenê xwe ê siyasî hewla yekgirtina Kurd û damezraweyeke neteweyî daye, bi taybetî rêberê me ê mezin dr. Qasimlo bona gihîştina bi vê armancê hewle tewaw û di cihê xwe de da, û ji mêjve bû ku hest bi vê hewcehiyê kiribû, û li ser vê baweriyê jî bû ku ew damezrawe pêkhatyek be ji kesên şarezayê pirsra Kurd û dostên Kurd di derveyî welat, û her li ser bingeha vê bîrokeyê jî bû ku pêşniyara pêkanîna konferansa Parîsê kir û di yekemîn beşdariya di civîna Enternasyonala Sosyyalîst de biryarnameyek li ser Kurd da pesend kirin û bi xweşî ve niha bona gihîştina bi vê armancê û pêkanîna vê Kongireyê derfetek baş hatiye pêş û ji aliyê rêzdar Mesûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê, partî û aliyên siyasî ên Kurdistanê bo bi armanc gehandina vê piroseyê hatine bang kirin.

Di vê derheqê de PDKÎ bi hestkirina bi berpirsatiya siyasî û neteweyî pêşwaî ji vê piroseya giring kir û bo serkevtina vê kongireyê ku biryar e di pêşerojê nêzîk de di Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê bihê girtin tewaya hewla xwe bi akr anî.

Pirseke din ku hewce dizanim basê bikin, û niha baseke rojê ye, dest bi kar bûna Hesên Rûhanî serkomarê nû ê Îranê ye ku her kes û aliyek ji dîtingeha xwe ve vê pirsê şirove dike. Bi berçavgirtina pêkhatiya siyasî û yasaya bingehîn ya Îranê siyaseta danîn û biryara yekalîkirina pirsên giring di deshilata rêber de ye û serkomar birêveber û peyrewkerê vê

deshilata bilind e. Bo selimandina vê qisê ezê qala axavtineke Elî xamineyî bikim, ku di dema axavtinên berbîjarên rejîmê de got: "Daxwazê ji wan dikim ku sozê nedin ku di şiyana wan de nebe!". Hesên Rûhanî di dema hilbijartinê de basê asayîkirina pêwendiyên wan di gel Rojava ji riya diyalogê ve kir, û basê kêmkirina tehrîman kir û di astê navxweyî de jî, basê dabînkirina azadî bo tak û civakê kir, û basê beşdariya jinan di piroseya siyasî û îdarî de kir, basê azadiya girtiyên siyasî kir, û soz da xelkê ku jiyana wan baştir bike, û tewaya kêmasiyan dixiste ser milê ên berî xwe de.

Lê piştî hilbijartina gotara Hesên Rûhanî guherîn bi ser de hat, û qise li ser berdewambûna wan li ser domandina piroseya etomî bi dîplomasiyê nermtir û piştewaniya ji rejîma Beşar Esed, û pêdagirî li ser siyaseta pêşîn ên Komara Îslamî ya Îranê kir.

Heke em bi hûr çav li kabîne û pêkhatiya heyeta wezîran ya pêşniyarkirî û axavtinên wî ên li rêûresma sondxwarinê de bikin, bersiva gellek ji wan pirsyarên ku bo xelkê Îranê û çavdêrên siyasî di holê de bû, hatiye dan, piraniya wezîran her ew karbidestên payebilind ên rejîmê ne ku xelkê Îranê tûşî vê hemû balayê kirne. Ew bas ji azadiya tak dike, lê di akbîneya wî de tenê jinek jî nahê dîtin, di demekê de ku nîva deng jinan daye navbirî, li vê de ye ku dadperweriya Hesên Rûhanî êşkere dibe. Bas ji beşdariya tewaya pêkhatiyên welat kir, li vê derheqê de jî tu beşdariyek nahê dîtin û qala yek herêmbûn û yek netewî bûn û yek zimanbûnê kir û bi êşkere haşa ji şûnasa neteweyên Îranê û mafên wan kir.

Xûşk û birayên hêja!

Rejîma Komara Îslamî ya Îranê bona derzbûna ji vê kirîza ku di astê navneteweyî de di gel ber-

birû ye li vê bi nav hilbijartinê de siyaseteke bi firtûfêl girte pêş, û ew hilbijartin di Şevra Nobedar de bi awayekê endazyarî kir ku ezmûna hilbijartina sala 1388'an (2009) ducarî nebe û li vê guherîna mohreyan de carek din raya giştî xapand.

PDKÎ her wek pêştir xwendina xwe li ser vê hilbijartinê bas kiriye û li ser vê baweriyê ye ku rêberên rejîma Komara Îslamî bawerî bi tu vekirinek siyasî ku di berjewendiyê civatên xelkê de be nine, û li ser siyaseta serkût û zextê wê berdewam be. Hekî rojê jî ew kirîz wan bixe tengaviyê de jî, her wek ku edetê wan e, seranên vê rejîmê li astê siyaseta navdewletî de hest bi metersiyê bikin, û gefa nemanê li ser wan be, dest ji tewaya pirojeyekê bo mana xwe û rejîma xwe tînin û zexta li ser xelkê di navxwe de zêdetir diki. Bi vê şiroveyê tenê riya ku li pêşiya gelên Îranê û tevgera demokrasîxwaziye li welatê mede maye, yekîti û yekgirtina hêzên siyasî ên Îranê ye, di vî warî de PDKÎ hem di astê sertaserî de û hem di diyalog û alîkariya tevê hêzên siyasî ên Kurdistanê li hewlê de ye, û bi xweşî ve ew pêvajoya di gellek warî de bandora xwe ya pozetîv hebûye.

Xûşk û birayên birêz!

Di vê rêûresma dîrokî de carek din li ser binemyên teşkîlatî û fikrî ên partiya xwe bo xebat û bidestveanîna mafên neteweyî ên gelê Kurd û dabînkirina azadî û demokrasî û dadperwerî û parastina buhayên demokratîk, piştewaniya siyasî ya xwe ji tevgera nîştimanî ya parên din ên Kurdistanê û giringîdana bi siyaseta pêkve jiyana aştiyane li ser bingeha qebûlkirina mafên neteweyî ên gelê Kurd di gel gelên Rojhilata Navîn û cîhanê û herweha xebata dijî terorîzmê pêdagirî dikin, û li gel rêberên şehîd ên xwe Qazî, Qasimlo û Şerefkendî û hezaran şehîdên rêbaza demokrat soz û peymanê nû dikin ku heya bidestveanîna hêviyên wan li ser xebatê berdewam bin û em wan xatircem dikin ku tu hêzek nikare îradeya tekoşerên demokrat lawaz bike û wan ji riya xebata wan heya gihîştina bi armancê a gelê Kurd pêngavên wan sist bike.

Silav li PDKÎ

Hilose Rejîma Komara Îslamî ya Îranê
Serkeve tevgera neteweyî demokratîk a gelê Kurd
Her sax bin
Sipasiya we dikim

Nerîna Lîderan



Edlî
Mensûr:

“Gelê Mîsrê faşîsma olî qebûl nake”.



Erdoxan:

“Hekî biryarên Kongireya Neteweyî dijî ewlehiya nîştimaniya Turkiyê be, emê guhertinê bi ser pêwendiyên xwe ên bi Hewlêrê re bînin”.



Rûhanî:

“Siyaseta derve cihê dana diruşman û tekbrî gotinan nine”



Elî
Teyibniya:

“ Ehmedînijad şaşiya şahê Îranê yê berê ducarî kir”.

Qasimlo bîrmend û rêberê PDKÎ

N: Edrîs Ehmedî

Dîroka PDKÎ em dikarin ji gellek dîtingehan û bi gellek meremên cuda ve basê bikin. Her çend ku Dr. Qasimlo di pirtûka “Çil sal xebat di riya azadiyê de”, bi sedema metoda dîrokna-siyê dewra tak di dîroka PDKÎ de kêmrang dike, lê heke merem nirxandina rolê tak di dîroka vê rêxistinê de be, em dikarin çar qonaxan jêre destnîşan bikin.

Qonaxa yekem: Pêkhatina PDKÎ û rolê Qazî Mihemed wek yekem rêberê vê partiyê, û herweha serkomarê Kurdistanê ye ku niha jî tev de be, bandor li ser gotara nasyonālîzma Kurdî li tewaya Kurdistanê de heye.

Qonaxa duyemîn: Jidestdana serbixweyiya PDKÎ ye li serdemê rêberiya Ehmed Toftîq de.

Qonaxa sêyemîn: Ne tenê bidestveanîna serxwebûna siyasî ji PDKÎ re ye, belkû pêk tê ji avakirin, û bi rêxistinkirin, bi cemawerîkirin, û herweha jêhelbirina pêgeha PDKÎ wek hêza sereke ya Kurdistanê û heta Rojhilata Navîn jî.

Di vê rêyê de jî bi birêvebirina şereke çekdarane ya berdewam û berfireh di dema jiyana xwe de û heya radeyekê bi navdewletîkirina pîrsa Kurd, berhema rêberîkirina Qasimlo bû.

Qonaxa sêyem û çarem têkêlî hev in, û qonaxa erkên giran ên rêxistina PDKÎ ye ku li stûyê rêberê mezin Dr. Şerefkendî bû.

Qona çarem herweha qonaxa ragirtina PDKÎ bûye, wek hêzeke bi bandor, di jeopolîtîka Rojhilata Navîn de, piştî şehîdkirina Qasimlo û bidawîhatina şerê di navbera Îran û Iraqê.

Renge di salvegera avakirina PDKÎ de tiştê herî asayî baskirin ji qonaxa yekem be.

Helbet qonaxa sêyemîn ew qas giring e ku zêderewî nine ku heke bas ji rênsansa PDKÎ bihê kirin, lewra di cihê xwe de ye ku di salvegera avakirina PDKÎ de her dem giringiya qonaxa yekem û sêyem bi hev re bihê baskirin.



ji xwe re çê dike.

Tevî vê yekê jî qonaxa sêyemîn giringiyek heye ku kêma bala xwe danê. Ew jî dariştina sitratejiyê bo PDKÎ ji aliyê Qasimlo ve ye.

Peyva sitratejî gellek caran tê bîkar anîn, lê kêma caran tê pênasekirin. Me hewcehî bi pênaseyêke bi bandor e, bona têgihîştina ji vê ku Qasimlo ne tenê rêber bû, belkû bîrmendekî sitratejîk jî bû.

Bê guman di dîrokê de ew cure rêber kêma hildikevin. Sitratejî pêk tê ji sê beşan. Lewra her bîrmendekî sitratejîk li dariştina sitratejiyê de sê erk li stûyê wê ne.

Ya yekemîn pênasekirina berjewendiyê neteweyek, welatek yan partiyekê ye, û her weha di vê derheqê de diyarîkirina wan armancên ku divê xebat jêre bihê kirin.

Ya duyemîn jî destnîşankirina xeter û metersî ye li ser wan berjewendiyên (çi metersiya nihayî yan çavniherkirî be). Ya sêyemîn jî biryardan e li ser şeweya herî di cihê xwe de ya îmkanatên siyasî, aborî û leşkerî bo berevanîkirina ji wan berjewendiyên û gihîştina bi wan armancên ku pêştir hatine diyarîkirin.

Dariştina sitratejî bi kurtî tevliheviyek e ji îmkan û armancan. Gellek caran kesek partiyek yan girûpek tê û komek armancên mezin diyarî û destnîşan dike, û bi bê vê ku bizane komeke dijminan

Lê jiber ku giringiyê nadne erkê sêyemîn, di rastî de li dariştina sitratejiyê de ser nakevin, belkû zêdetir mijûlî baskirina ji hêvîyan dibin. Lewra erkê sêyemîn biryarder e li piroseya dariştina sitratejiyê de, jiber ku ew îmkanat li ber destê her ektereke siyasî de bin, sînardar dike li diyarîkirina armanc û armanên xwe de.

Qasimlo bîrmendekî sitratejîk bû, jiber ku ew erk bi serkevtin ve bi cî gehandin. Em dikarin bêjin ku Qasimlo yekem rêberê Kurd e ku bi awayeke herî baş sitratejiyê dadirêje.

Qasimlo berjewendiyê giştî ya neteweya Kurd li mafê dîharîkirina çarenûsê de pênase kir. Lê bi sedema parvekirina Kurdistanê û rewşa jeopolîtîk ya Kurdistanê Dr. Qasimlo dariştina sitratejiyê sînardar kir bo PDKÎ û Kurdistanê Îranê. Lewra mafê dîharîkirina çarenûsê li ber ronahiya rewşa Kurdistanê Îran ya wê demê di şiklê “Otonomî bo Kurdistanê û demokrasî bo Îranê” de dîharî kir, ku dawî car di armanca PDKÎ de rengveda.

Wî Komara Îslamiya Îranê wek tehlûkeya sereke li ser berjewendiyê Kurd û xebata bo demokrasîyê li Îranê de destnîşan kir. Tevê vê ku sîstema neteweyî li ser Kurd di tewaya parên Kurdistanê de ji aliyê hejmareke berçav

Dom R: 6

Ez dixwazim ku bi hezkiriyên xwe re yad û bîrekê ji hevalên koçkirî bikim, ew hevalên ku li ser sivka hejarane ya di nav tarîtiyê de li dewra yektir matmayî lihev civiyabûn, û li "Şîva êvariya Xerîban" de bi kiryar min beşdarî kir, û piştê min pariyê tall ê xem û nerehetiyê qurt kir.

Celalê bêserûşûnkirî tenê yad û bîra wî ya pîroz bû ku tarîtiya nav koma me de tarîtir kiribû,



şehîd mela Xidir û Birayîm û Hacî di qada şerê tarîti û ronahiyê de canê xwe goriyê nîştîmana xwe kirin, dilsoz û niyetpak kak Elî He-

seniyânî li derve û li xerîbatîyê û li bêkesiyê de xatrê xwe xwastin.

Mam Hêmin 27 sal û çend rojan berî niha li warê xwe de serê xwe danî. Her çend ku Mam Hêmin li ser milên ciwanên welatparêz û di nav koma taziyebarana rastîn ya xwe de bi ew qasê rêz û hur-

met ve bi axê hate sipartin, lê bi eşkerekî dikarim bêjim ku wî jî li şeweyê xerîbiyê de serê xwe danî. Ew nejdil mir. Ew bi hemû

Şîva Xerîban

hêz û şiyana xwe dijî rêdîn û çekmeyên Axûndên zal bi ser Îranê de bû. Wî qet nedixwast ku di nav rewşa ku qudret û hêza jêr deshlata pan Îslamîzma Komara Îslamî ya Îranê hebe, xatrê xwe ji jiyandê bixwaze.

Piştê jî ez bixwe mirim. Bi qewlê mam Hêmin, ên mirî dîsan jî mirin, bi terora rêberên serkirde, ez gellek carên din jî mirim, niha ez mirî me û para miriyan dixom, û Herîf Qadir jî piştî temenek pêşmergatiyê ji vê dunyayê çû û mir.

Dawî kesê nav vê koma taziye de kak Silêman Çîre bû ku piştî berêkaniyek zaf bi nexweşiyê dijwar re, mixabin wî jî li xerîbiyê de koça dawiyê kir. Ew dawî pelgê veriyayî yê ê çîqa koma vê şevê ye, riha her hemiyana şa be.

Di sersaxiya kak Silêman Çîre de gellek ji partî û sazî û aliyên curbicur û kesayetiyên Kurd û xeyrî Kurd beşdarî kirin, gellek helbest û peyama hatin xwendin, û kesên weha jî hebûn ku tevî xwendina peyamên xwe giriyan.

Serxweşiya kak Silêman Çîre bi vê pan û berfirehiya ku ji sedî 98 heya 99 jê Kurd bûn, dersek mezin tede hebû, û ceribandinek hêja anî bîra me, ku ew jî ew bû ku ji bilî destê te, tu destek din te naxorîne.

Solêyman bi kiryar ji vê ceribandîna re derbaz bibû, û bi zanebûn bawerî bi vê ceribandîna û çend ceribandîna din anîbû.

Pêkhateya vê kombûna xelkê li dewra yektir di vê taziye de carek din ew rastiya selimand ku Kurd yan her neteweyek ên li jêr zulmê de divêt piştê xwe bi dest û bask û enirjî û hêz û şiyana zatî ya xwe, û alîkariya bê şert û merc û dilsozî û camêriya niyazpakên rastîn ên ser vî erdî girê bide, û bes.

Xwezî ku ew hîpokratên ku bi xapandin û firt û fêlên curbicur zarokên bindest diberdne canê yektir, rojekê vijdana wan ya razayî ji xevê vecinîqê û bi yekcarî dest ji wan bazerganiyên bê çine hilgirin.

Dîsan ducarî dikim ku ya xwedê yên ku bazerganiya rondik û xwînê dikin, şermezare hawar û nalîna neteweyên bê sitargeh bin.

Doma R: 5'ê

ya neteweya Fars, Ereba û Turka ve tê piştevanîkirin, lê Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku nabe wan neteweyan wek dijmin destnîşan bikin, belkû li her çar welatan de hikûmeta nawendî ya sitemkar û dijî Kurd wek tehlûke li ser berjewendiya neteweya Kurd destnîşan kir.

Dawî car divêt Kurd û ew neteweyên din jiyana aştiyane bihevre li Rojhilata Navîn de derbas bikin, lewra nabe wek netewe bibne dijminê yektir.

Dijminatîya di navbera neteweyan di gellek cihên cîhanê de helandina etnîkî û jînosaydî lê ket. Qasimlo dixwast bi dijminatîkirina bi hikûmeta nawendî ya sitemkar re ku wek tehlûke li ser berjewendiya Kurd bû, neteweya Kurd ji wan cure dijminatîyan biparêze.

Qasimlo bi dirustî li ser vê bawerê bû ku ew îmkânên li ber destê Kurd de ne, sînodar in û rê nadin ku armancên bilindtir ji mafê dîharkirina çarenûsê di çarçoveya wan

welatên Kurdistan bi ser wan de hatiye parvekirin, were dîharkirin. Bo mînak rewşa jeopolîtîk ya Kurdistanê tevî Bengiladîşê dida ber hev û digot ku Bengiladîşê dixwaze ji welatekê cuda be, û bi sedema destpêregihîştina wê bi behrê, xwediyê kûrahiya sîstratejîk bû, û piştevaniya welateke wek Hindûstanê hebû, li demekê de ku Kurd bi çar dewletan re berbirû ye û ne dostên wê hene û ne jî destê wê digîje behrê.

Ku weha bû Qasimlo hevdem bîrmenedekî sîstratejîk ê rastîn bû, û sîstratejiya PDKÎ li ser bîngeha parsengiya hêz darişt. (hêjayî basê ye ku rêxirawên Kurdî hene ku armanca wan serbixweyî ye, lê yan nekarîne li qada xebatê de bin, yan eva ku neçar bûn destê jê hilgirin, û bi watayek din derbê li bîra serxwebûna Kurdistanê bidin, ku eva jî nîşan dide ku ew xwedî sîstratejî nebûn).

Lê Qasimlo jêve bû ku Kurd dikare di rewşa vekirî ya siyasî de ji hêza cemawer mifahê wergire û xelk bo piştevaniya armanca

bidestveanîna mafê dîharkirina çarenûsê û demokrasiyê teyar bike.

Di nebûna rewşa siyasî ya vekirî Qasimlo bawerî bi xebata çekdarî hebû, û digot em şer dikin bo gotûbêjan, wate ji riya xebata çekdarî ve Kurd dikare hikûmeta nawendî neçar bike bo gotûbêjan û dawî car jî gotûbêj bo çareserîya aştiyane û dadperwerane ya pîrsa Kurd. Qasimlo her weha jêve bû ku Kurd dikare ji dîplomasiyê mifahê wergire bo gihîştina bi armancên xwe, lewra di serdemê qasimlo de hewleke berfireh hate dan bo navdewletîkirina pîrsa Kurd.

Her weha bi avakirina Radyoya Dengê Kurdistanê Îranê şeweyek din ji dîplomasiyê bi kar anî ku bi dîplomasiya giştî tê naskirin, û armanc bandordanî e li ser raya giştî. RDKÎ û bilavokên din ên PDKÎ bi zimanê Farsî bi armanca agehdarkirina raya giştî ya Farsan bû li ser sîstema neteweyî li Kurdistanê û hewildan bo çekirina dost û hevalbendan bo pîrsa Kurdistanê û bo demokrasiya di Îranê de û di nav neteweya Fars de.



Terorîzm emrazek din e ku Kurd dikare mifahê jê bistîne, lê Qasimlo ku bixwe bû qurbanîyê terorîzmê ew metod wek pîrensîp ret dikir û bi xisarhilgir dizanî.

Bi sedema vê ku Qasimlo hem rêber û hem bîrmenedekî mezin ê sîstratejîk jî bû, çawan li jiyana xwe de bandor li ser Kurdistan, Îran û heta herêma Rojhilata Navîn jî hebû, piştî şehîdbûna xwe jî, her wek di yek ji diruşmên endanên PDKÎ de bi dirustî hatiye: "Qasimlo di rêbaza xwe de zindî ye".



Şehab Xalidî

A vakirina partî û rêkxirawan abi armanca bidestveanîna mafên neteweyî û siyasî û bihevre karkirin, yektir qebûlkirin, û pêkanîna eniyek hevpar li ser bingeha berjewendiya neteweyî, bê guman dikare ku xelkê hêvîdar bike û civakek azad û demokratîk ava bike.

Her di vê rastayê de Kurdên Sûriyê jî ku berdewam li jêr zext û givaş û serkûta bê rehmane ya deshilatên yek li pey yek ên Sûriyê de bûne, û kêmtirîn maf bo wan bi rewan nehatiye dîtin, qet ji xebat û tekoşînê nesekinîne, û bi her şeweyekê ku karîbin, li gorî şert û mercên welatê xwe, partî û rêkxirawên siyasî ava kirine, û bo bidestveanîna mafê neteweyî û siyasî xebat kirine.

Piştî çendîn salî zext û givaş, niha ku pêlên Buhara Erebi rû li Sûriyê kirine, û mixabin heya niha jî ew pêlên bihêz ên Buhara Erebi, bi sedemên curbicur nekarîne dawiyê bi deshilata Beşar Esed bînin, û



Yek helwestî hewcehiyek dîrokî û erkek neteweyî

êdî gellek kes wek Zivistana Erebi li Sûriyê de basê dikan, yekîtî û yek helwestiya Kurdan û mifahwergirtin ji vê derfetê ji aliyê partiyên siyasî ên Kurd ve erkek ew qas giran û dîrokî dixê ser milên wan, ku heke bi başî wan erkan bi cî negehînin, gelê Kurd û dîroka Kurd ji wan xweş nabe, û wê nirxa vê yekê jî bidin.

Niha derfetek weha hatiye pêş ku beşek ji Kurdistanê Rojava di destê Kurd de ye û partî û rêkxirawên siyasî ên Kurdistanê divêt li ser bingeha berjewendiyên neteweyî û bi dîr ji her şewe xwe mezinzanîne, û liberçavgiyê berjewendiyên partî û rêkxiraweyî, kar bo yekdengî, yek helwestî û pêkanîna eniyek hevpar li hemberî pîlanên rengareng ên dijminên Kurd de bikin, û bi vî awayî Kurdistanê Rojava biparêzin.

Bi taybetî di vê qonaxa hestiyar

de ku rijandina xwîna xortên Kurdan bi helal hatiye zanîn, û biryara cîhadê bi dijî Kurdan hatiye dan, tenê û tenê yekgirtin, û pêkanîna eniyek hevpar ji hemû partî û aliyên siyasî ên vê para Kurdistanê, dikare pîlanên wan yek li pey yekê bike bilqa ser avê, û civakek azad û demokratîk bo wan destber bike.

Niha çavê Kurdan li her ciheke vê cîhana pan û berfireh li Kurdistanê Rojava ye, û her gulleyek ku li leşê xortekê Kurd di vê beşê de dikeve, bê guman dilê wan jî diêşîne, û wan zêdetir azar dide.

Lewra yekîtî û yekdengiya wan dikare gelê Kurd di hemû ciheke vê cîhanê hêvîdar bike, û alîkariya wan jî bo aliyê xwe rakêşe.

Di vê rastayê de ew partî û alî dikarin pêgeha xwe di nav xelkê xwe de qahîm bikin ku amade bin zêdetirîn nirxî bo berjewendiyên neteweyî bidin.

Lewra jî hestkirina bi berpirsatiyê û bi cî gehandina erkê pîroz ê neteweyî li qonaxa niha de dikare zêdetirîn deskevtan bo xortên Kurd di vê para Kurdistanê de bi dest bîne, û gelê Kurd jî di pêşerojê de bibe xwediyê civakek azad û demokratîk ku têde yasa serwer be, û piloralîzma siyasî ji pîverên sereke ên pênaseya vê civaka demokratîk be.

Heyeteke PDKÎ di rêûresma danîna lewh û

monomêntê li ser mezarê şehîdan de beşdarî kir



Roja 26'ê Gelawêja 1392'an(2013) di rêûresmekê de ku bona rêzgirtin ji hejmarek ji şehîdên PDK Îranê ji aliyê Nawenda Rewşenbîriya bajarokê Baziyane ve hatibû rêkxistin, PDK Îranê bi awayek fermî hat bangkirin.

Şandeya PDKÎ bi serperestiya birêz Tahir Mehmûdî Endamê Komîteya Nawendî, beşdarî di danîna lewh û monomêntê li ser mezarê şehîdên PDK Îranê li Baziyane de kir.

Di rêûresmê de birêz Tahir

Mehmûdî serbarê bas ji 25'ê Gelawêjê salroja avabûna PDK Îranê û qonaxên dijwar û pir ji zehmetî ên xebata PDK Îranê, sipas û pêzanînen xwe pêşkêşî Mûdir Nahiye û Nawenda Rewşenbîriya Baziyane û dam û dezgehên peywendîdar kir.

Piştî Ref'et Fethulla birêveberê nahiya Baziyane, serbarê derbirîna pêzanînen xwe derheq beşdariya heyeta PDK Îranê di rêûresmê de, birêvebirina wê erkê bo qedirgiranî û herweha rêzgirtin ji xebat û fidakarî û serweriyên PDKÎ vegerand û bi çavek pir ji rondik û hestên Kurdîni ve ragehand: "Şanazî û qurbanî û şehîdên PDK Îranê bi qasekê zaf in ku em weke netewa Kurd li herçar parên Kurdistanê, bi çavê rêz û hurmetê ve jê dinêrin.

Ev her du xûşk hîn jî dijîn



A VESTA KURD - Di dema komkujîya Helebçe de, xûşkekê, xûşka xwe ya biçûk daye piştî xwe û ji tirsî mirinê digirî.

Ew wêne di dema komkujîyê de hatiye girtin.

Ew her du xûşk hîn jî dijîn û li Helebçe dimînin.

Wêneyê zarokên ku digirîn, li seranserê dinyayê bûne poster û hatine belavkirin.



Hevpeyvîn: Faxir Mewlûdî

Firamerz Kaşîfî kurê Mehmûd, sala 1322'an(1943) li bajarê Nodşê û di malbatek desteng de tê dinê. Firamerz dema ku tê dinê dayîka xwe ji dest dide, lewra derwana zarokatiya xwe bê dayik derbaz dike.

Her weke piraniya zarokên wî çaxî ên Kurdistanê, Firamerz jî bi sedema destengî û hejariyê nikare here xwendîngê û ji xwendinê bêpar dibe.

Firamerz Kaşîfî li dor nasiyariya xwe tevî PDK'î weha diaxive: "Di serdemê ku Ehmed Tofîq Sekreterê PDK Îranê bû, birayek min bi navê Sidîq Hewramî pêşmerge PDK Îranê bû.

Rojekê Ehmed Tofîq weke sekreterê Partiya Demokrat hate "Tewlêlê" û piştê ber bi bajarê Nodşê hat û li mala me sekinî.

Ehmed Tofîq daxwaz kir ku xelkê Nodşê kom be û piştî axavtinek zaf, ji xelkê re got ku sibê gerek hûn hemû bîn bo Tewlêlê, roja din xelkê gund bi giştî çûne "Wezlê" ku dikeve piştê Tewlêlê, li wir cardin Ehmed Tofîq ji xelkê re axivî û paşan em ber bi malên xwe vegeyan. Tê bîra min ku wî çaxî 37 kes ji xelkê Nodşê di refên PDK Îranê de pêşmerge bûn.

Firamerz Kaşîfî tevîbûna xwe bi refên PDK Îranê re weha tîne ziman: "Tê bîra min ku rojekê Ehmed Tofîq ji min re got, PDK Îranê partiya xelkê Kurdistanê ye û tu carî ji nav naçe û hertim

dimîne, ew go-tina Ehmed Tofîq her di mêjiyê min de bû heya Sala 1357'an(1978). Hemese'îd Kalkal ku wî çaxî berpîrsê binkeya Nodşê a PDK Îranê bû, çend kes şandne pey me da ku bona şer tevî rejîma paşatiyê, çek û teqemeniyên ji "Tewlêlê ve ber bi Nodşê bibin.

Wî çaxî meşên nerazibûn û şoreşê li dijî rejîma paşatiyê taze dest pêkiribûn, em çûn û me çek û teqemenî gehandin Nodşê.

Eva ji aliyekê bû despêka şerê PDK Îranê tevî rejîma paşatiyê û ji aliyê din ve bû despêka pêşmergeatiya min, ji berku ez ji roja barkirina wan çek û teqemeniyên ve bi awayek fermî bûme pêşmerge PDK Îranê."

Firamerz roja herî ne xweş a jiyana xwe weha tîne ziman: "Roja herî nexweş a jiyana min roja şehîdketina "Xwedayê niştiman" wate Dr. Qasimloyê rêber e, ew roj bi qasekê rojek bi êş bû ku heya ez li ser erdê bimînim wê rojê ji bîr nakim.

Tê bîra min ku em li "Qislanê" bûn dema nûçeya

şehîdketina şehîd Qasimlo hat, gellek ji pêşmerge xwelî bi serê xwe de dikirin."

Firamerz li dor roja herî xweş a jiyana xwe weha ji Agiriyê re diaxive: "Tu rojek xweş di jiyana min de nine, ew roj dibe roja herî xweş a jiyana min ku xwedayê mezin, "Xwedayê niştiman" a min cardin zindî bike, eva dibe roja herî xweş a jiyana min di herdu cîhanan de, herçend dizanim ku cardin "Xwedayê

niştiman" sax nabe, lê ez heya dimirim rêvîngê rêya wî me.

Ez pir ji Dr. Qasimlo hez dikim, bawer bikin sê birayên min çûne ber rehetê rondik ji çavên min nehatin xwar, lê ji boy Dr. Qasimlo min bi dilek şewitî pirr rondik barandin."

Firamerz Kaşîfî ne xwendewar e lê bi sedema pêşmergeatiyê û geriyana di Îraqê de, zimanê Erebi bi başî dizane û qise dike.

Firamerz dibêje: "Jiber ku ez rêvîngê rêya "Xwedayê niştiman" im, heya niha jî bo yek deqêyê jî bi dirêjahiya temenê pêşmergeatiya xwe, min seh bi mandîbûn û sekinînê nekiriye û we xatircem dikim ku heya deqeya dawiya jiyana xwe jî ez vê rêbazê bernadim, lewma daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikim ku piştevanê PDK Îranê bin û herweha hêvî dikim ku Partiya Demokrat her bimîne û em jî şehîdan ji bîr nekin û rê û rêbaza Dr. Qasimlo bilind ragirin."

Firamerz Kaşîfî bi vê gotinê hevpeyvîna xwe bi dawî tîne: "Ez ji tewahiya kadr û pêşmerge PDK Îranê razî me ji hemûyan hez dikim, lewma weke kadr û pêşmerge Partiya Demokrat daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikim ku xwîna şehîdan jibîr nekin û herweha ji aliyê Komara Îslamî ve nehên xapandin, jiber ku mafê me ye ku weke tewahiya netewên din ên cîhanê xwediyê ziman û hikûmeta xwe bin."



pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê di dema bêhnvedaê di çiyayên Kurdistanê de

Foad Xakîbêygî sekreterê YCDKî: “Rêkxirawa me pitir ji 67 sal e ku mil bi milê tevgera netewî demokratîk a xelkê Kurdistanana Îranê di qonaxên curbicur ên xebat û tekoşînê de beşdar bûye û gellek ji lawên leheng û cangorî jî di vê rêyê de canê xwe pêşkêşî baregehên azadiyê kirine”.



Foad Xakîbêygî:

Sala 1975'an rêxistina NY bo car yekemîn rêz ji roja cihanî a Lawan girt. konfiransa cihanî a lawan roja 8 heya 12'ê heyva August a sala 1988'an, kombûnek li bajarê “Lisbon” a pêtextê welatê Portoqalê lidar xistin û tê de pêşniyara bi fermî naskirina roja cihanî a lawan pejirandin.

Civata giştî a rêxistina NY jî, roja 17'ê December a sala 1999'an, bi pejirandina biryarnameya 120/54'ê, roja 12'ê Augustê weke roja cihanî a lawan bi fermî nas kir. Bi vê hincetê û herweha birêveçûna kongireya heftemîn a Yekîtiya Lawên Demokrat ên Kurdistanana Îranê ku li 4 heya 8'ê Gelawêja sala 1392'an (26 - 30'ê Julay a 2013) bi navê kongireya “Derxistina şiyanan” û li jêr dirûşma “Xwe sazdan ber bi pêşerojek ronî” birêve çû, me hevpeyvînek digel rêzdar Foad Xakîbêygî Sekreterê Giştî ê Yekîtiya Lawên Demokrat ên Kurdistanana Îranê encam da ku em bala xwînerên Agiriyê jê re radikêşin.

P: Encam û rasipardeyên kongireya heftemîn a Yekîtiya Lawên Demokrat a Kurdistanana Îranê çawa dinirxînin?

B: Kongireya heftemîn wate kon-

gireya “Derxistina şiyanan”, hejmarek biryar û rasiparde peji-randin ku di rastî de di qonaxa niha a xebatê de, hewce ye tevî dirêjîdan bi karûbarên rêxistinî û peywendî û ragehandin di cihana derve de, bona kûrahiya sitrati-jiya kar û xebata xwe ku navxweyî welat e, pitir hewil dide, herweha mikanîzmên bêtir û guncawtir ji rêveberyê re diyarî kiriye.

P: Pênaseyek kurt li ser lawan bo me bike?

B: Di pîrensîpên navnetewî de bi kesekî law (ciwan) tê gotin ku temenê wî/wê di navbera 15 heya 30 saliyê de be. Di vê peywendiyê de bername û peyrewa Yekîtiya Lawan jî vê pîrensîpê li berçav digire û tevî mercên din ên endambûnê, di vê temenê de rêkxirawa me endaman werdigire. Eva dewrana lawiyê ye û mirov di vê temenî de hewla peydakirina bersiva dehan û sedan pirsyarên jiyane dide.

P: Di bereberê hatina roja cihanî a lawan de, hûn rewşa lawên Kurdistanana Îranê çawa dinirxînin?

B: Hekî em niha bixwazin bê vê ku

tûşî bêhêvîbûnê bibin û herweha bi hêvîdarbûn bi xebata xwe a pêşerojê, avrûyekê ji rewşa lawên Kurdistanê bidin, mixabin dibînin ku law di Îranê bi giştî û Kurdistanê bitaybetî de, di rewşek pir dijwar de dijîn, diyardeyên nehez ên civakî di bin bandora siyasetên Komara Îslamî de, rewşek afirandine ku derfeta geşekirina lawan ber bi cihana modêrn nemumkîn e, bêkarî, îdz û îtiyad, nemana bi-jardeyan, bilindbûna hêla hejariyê, rewşa aloz a aborî û ...hwd zext û givaşek zaf xistiye ser lawan, jiber ku welatê Îranê bi welatek law tê naskirin û piraniya nifûsa wê ji lawan pêk tê.

P: Peywendiyên we tevî law û rêkxirawên taybet bi lawan li seranserê cihanê çawa ye?

B: Yekîtiya Lawên Demokrat ên Kurdistanana Îran bi xweşî ve hekî nebêjim bêminak e, rêkxirawa herî kêr mînak a taybet bi lawan e li ser astê Kurdistanê ye ku peywendiyek berfireh tevî piraniya rêkxirawên lawan li herçar parên Kurdistanê heye.

Li ser asta navnetewî jî tevî beşek zaf ji rêkxirawên cihanî ên weke lawên Sosyal Demokrat, LNU ya

Norwêjî û ...hwd endam e, û herweha di pêşerojek ne dîr de jî, emê mizgîniya endambûn di çend rêkxirawên din ên cihanî de jî, bidin endam û alîgirên Yekîtiya Lawên Demokrat ên Kurdistanana Îranê.

P: Gelo bi baweriya we erkê Yekîtiya Lawên Demokrat ên Kurdistanana Îranê di rewşa niha a xebata gelê Kurd de gerek çi be?

B: Weke pîrensîp me hertim ragehandiye ku, rast e em weke rêkxiraw hewil didin ku xewnên lawan di Îranê de bikin rastî, lê rêkxirawa me pitir ji 67 sal e ku mil bi milê tevgera netewî demokratîk a xelkê Kurdistanana Îranê di qonaxên curbicur ên xebat û tekoşînê de beşdar bûye û gellek ji lawên leheng û cangorî jî di vê rêyê de canê xwe pêşkêşî baregehên azadiyê kirine.

Me bi eşkere ragehandiye ku di qonaxa niha a xebatê de, erkê ser milê me ye ku beşdariyê di tevgera netewî de bikin, jiber ku heya mafên netewî ên lawên Kurd di Kurdistanana Îranê de nehên dabînkirin, dabînbûna mafên wan ên pîşeyî nemumkîn e.



Dema bi kurdî stranan dibêjim hêstiran di çavên wan de dibînim

Hevpeyvîn: Arî Resûl

Hewlêr (Rûdaw) - Stranbêja Îsraîlî ya bi esil ji Rojhilatê Kurdistanê, Hedasa Yeşurun, ku li bajarê Xolon li Îsraîlê dijî û bi Aramî û Kurdî stranan dibêje, di yekem hevpeyvîna xwe ligel Rûdawê de behsa ahengên Newrozê li Îsraîlê dike û dibêje sedema ku ew stranan bi kurdî dibêje ew e ku ziman û muzîka kurdî li Îsraîlê biparêze. Hedasa Yeşurun herwiha pirr dixwaze ku serdana Kurdistanê jî bike: "Da ku vegerim ser reh û kokên muzîka xwe."

Pirs: Tê gotin tu dixwazî ku piştî meha Remezanê serdana Kurdistanê bikî û konsertan li wir saz bikî?

Bersiv: Gellek kesan daxwaz li min kirin ku serdana Kurdistanê bikim û konsertan saz bikim. Gellek kes dipirsin kengî serdana Kurdistanê dikî. Ez pirr kêfxweş im bi vê yekê û pirr dixwazim serdana Kurdistanê bikim. Lê divêt daxwazname ji aliyê hikûmetê yan saziyekê ve bê pêşkêşkirin. Lewma serdana min girêdayî wî kesî ye ku daxwaznameyê ji min re bişîne. Xewna min e ku serdana Kurdistanê bikim.

Ji bo karê hunerî min serdana gellek deveran kiriye, wek Viyana, Almanya û Tirkîyê. Lê mixabin heta niha min serdana Kurdistanê nekiriye. Ji bo cara yekê li Almanya-yê konsertek hat saz kirin, da ku tê de beşdar bibim, lê wiha rast hat ku dema wê ket roja şemiyê, ez jî pêbend im bi ola xwe. Lewma beşdar nebûm.

Pirs: Îsraîliyên bi esil ji Kurdistanê, pêwendiyên wan ligel Kurdên parçeyên Kurdistanê çawa ne?

Bersiv: Ew Kurdên ku li Îsraîlê ne, pêwendiyên wan li gel Kurdên seranserê cîhanê hene, nemaze Kurdên Îraq û Ewropayê.



Sitranbêja Kurd ya Îsraîlî Hedasa Yeşurun

Pirs: Tu hest bi çi dikî gava tu bi kurdî stranan dibêjî?

Bersiv: Stran û helbest giringtirin beşên çandê ne ku stranbêjan bi şewazên curbicur pêşkêş kirine. Min di stranên xwe de ronahî avêtiye ser çanda aramî û kurdî û şeydaya van çandan im. Lê bi zimanên Erebbî, Farisî, Tirkî û Îbrî jî stranan dibêjim. Ez wek erkekî xwe dibînim ku vê kultûrê biparêzim, da ku neyê jibîrkirin. Gava ez bi kurdî yan Aramî stranan dibêjim, pirr dilxweş dibim, ji ber ku dizanim bi rêya stranên xwe Kurdan kêfxweş dikim. Dema bi kurdî stranan dibêjim, hêstiran di çavên wan de dibînim. Piştî salên dijwar, niha dibînim ew dilxweş in.

Pirs: Tu dikarî bi kurdî biaxivî?

Bersiv: Na.

Pirs: Êdî tu çawa bi kurdî stranan dibêjî?

Bersiv: Ez nikarim bi kurdî bipeyvîm, lê gava straneke kurdî dibêjim, pêşî wateya gotinên wê bi tevahî fêm dikim, da ku zanibim stran li ser çi ye.

Pirs: Agahiyên te li ser Kurdistanê hene?

Bersiv: Dizanim Kurd neteweyeke bê welat in û heta niha serxwebûna xwe wernegirtine. Herwiha dizanim ku Kurdan di serdema Saddam de zehmetiyeke mezin kişandin.

Pirs: Tu li stranên kîjan hunermendên kurd guhdar dikî, pêwendiyên te ligel hunermendên kurd hene?

Bersiv: Hunermendên jêhatî yên

Kurdan pirr in. Niha mijûl im ku stranên Hesên Zîrek, Tahir Tofîq û Zekerîya ezber dikim. Pêwendiyên min ên rasterast ligel stranbêjên kurd nînin, lê guhdariya stranên wan dikim. Lê pêwendiyekê min a baş ligel hunermend Murad Kawa heye. Ji dengê Çopî pirr hez dikim û bi stîla wê pirraniya stranên xwe dibêjim. Strana wê ya herî xweş jî li ba min "Siya çemane" ye.

Pirs: Çi hevbeşiyekê kultûrî di navbera Kurdan û Îsraîliyan de heye, ku wiha li hunermendekê cihû bike ku bi kurdî stranan bêje?

Bersiv: Gellek tiştên hevbeş di navbera Kurdistan û Îsraîlê de hene. Li Îsraîlê hejmareke zêde ya Kurdan heye û berê jî hejmareke zêde ya Cihûyan li Kurdistanê hebû. Bav û dayîka min jî li Kurdistanê bûn. Ez bi zimanên din jî stranan dibêjim, lê gava bi kurdî dibêjim sedema wê ew e ku dixwazim ziman û muzîka kurdî li Îsraîlê biparêzim. Tevî ku ti mamosteyek nîne ku min fêrî kurdî bike, lê berdewam im li ser fêrbûna stranên kurdî.

Pirs: Hejmara kesên ku xwe wek Kurd dibînin û li Îsraîlê dijîn, çend e û bi giştî rewşa wan çawa ye?

Bersiv: Dora 120 hezar Kurd li Îsraîlê hene. Em li Îsraîlê ahenga Newrozê digerin û di wê rojê de derdikevin seyranê. Herwiha em dersên fêrbûna şahiya kurdî dixwînin. Em bi hev re ahengan digerin. Xwarinên kurdî amade dikin. Heta niha me amûrên muzîkê yên kurdî wek dahol û zîrnayê parastine. Lê hemû Kurdên vir bi zimanê kurdî nizanin, nemaze nîfşê nû, lewma bi zimanê Îbrî dipeyvîm.

Gotinên Pêşinan



A: Çiya Mazi

Dan û sitandin di destê xwedê de ye:

Ev gotin ji bo dan û standina giyan (rih) hatiye gotin. Jibo bo baweriya ku her tiştî jî xweda dide û distîne ye. Kes bi hêsanî nikare mafê kesî bidest bixe, bi zor bistîne.

Dar yê edebê bûya ji cenetê dervediket:

Heke dar û lêdan tiştêkî baş bûya ev navê ku ji cenetê derketiye nedihat ser wî. Misoger ne baş e ku ji cenetê (bihuştê) jî hatiye derkirin.

Dara ketî, yê bivirê xwe lê bidin pir in:

Dara ku li ser piyan be tu kes bi hêsanî nikare wê ji cihê wê bileqîne, lê piştî ku ket erdê li ber piyan e, her kes bi hêsanî dikare bivirê xwe lê biceribîne. Ji bo civakê jî wiha ye, civaka bê hêz bê xwedî bê reh herkes ji xwe re dike mal û pê dilîze. Mirovên bindest an ketî û lawaz jî herkes qerfê xwe pê dike an dixaze çoyê xwe li ser serî kil bike. Lê mirov û civakên bi hêz û xwedî piştî kes nikare nêzî wan bibe.

Dara xebatkara tim bi ber e :

Xebatkar hertim ji bo karekî an barekî henin, tim bar li ser milê wan in. Ku yek bibêje ez dê xebatê jibo tiştêkî bikim divê bar hilgire ser milên xwe. Dema dawîya xebatê tê jî, misoger tiştêkê tê holê. Wekî xebatkarê kargeha erebeyan, dawîya xebatên wan erebe çê dibe.

Şaristana Îlamê



Li gor serjimêriya vî bajarî ku sala 1390'an (2011) hatiye kirin, nifûsa vî bajarî 1,722,313 kes bûye ku piştî bajarê Kirmanşan û Sinê sêyemîn bajarê mezin yê kurdakincî yê Kurdistanê Rojhelat e û zimanê axavtinê yê xelkê vê deverê kurdî ye.

Bajarê Îlamê bajarek kevn e û di dirêjahiya kevnaretiya xwe de zêde nav guherîne, wek Alamtû, Erîwcan, Masbezan ku di vê sed-sala dawiyê de navê wê Dîwala û Husênawa bûye.

Îlama niha di sala 1308 (1929) de li vê devera ku digotnê Husênawa, hat çêkirin. Bi sedema kevn-

retiya vê deverê û pesendkirina ferhengistanê navê wê guherîn û danîn Îlam.

Bajarê Îlam di navbera çiyayên bilind ku piranî bi dar û bar e, hilketiye û av û hewayek hênîk û xweş heye û çavkaniyên ava wê jî zaf in û bixasmanî zêde sûlav hene wek sûlava çemava, abtaf, sirtaf, giçan, marberê û derbend.

Ji ber kevnaretiya vî bajarî, şûnwarên kevn jî hene wek kelha



valiyê Îlam, taqa Şîrîn û Ferhad, Koşka Felahetî, pira Gawmêşan, bajarê dîrokî ê Madakto, agirdan û tengeya behramê Çobîn, kelha

Ji cih û warên geryanê li vê herêmê de em dikarin qala wan cihan bikin:

Îlama niha di sala 1308 (1929) de, li vê devera ku digotnê Husênawa, hat çêkirin. Ji ber kevnaretiya vê deverê û pesendkirina ferhengistanê navê wê guherîn û danîn Îlam.

Gola cemik ya Abdanan, kelha Abdanan, Enbarên hizar deriyê Abdanan, agirdana Sasaniyan û taqa Şîrîn û Ferhad, bajarê kevnar ê Madakto, agirdana çartaqî, geliyê Erxewan, kaniyên ava germ, devera toristî ya Serabkelan, agirdana mûşkan, kelha sam û Îmamzadeya Pîrhusên û taqa Rostem û ...hewd.

Cûlyan, kelha Kelem, Kelha siyahkel

Qasa berhemanîna tirombêlan di Îranê de %50 hatiye xwarê



Kurdistanmedia: Bi sedema hisarên aborê ên civaka cîhanî bo ser Îranê, berhemanîna tirombêlan di Îranê de %50 hatiye xwar.

Li gor nûçegehaniyan, berhemanîna tirombêlan di çar mehên despêka îsal de li gor çar mehên despêka sala derbazbûyî, ji 339hezar û 835 dezgehan bo 182 hezar û 353 dezgehan hatiye xwarê ku ew yek tê vê wateyê ku %42 berhemanîna hatiye xwar.

Hatinexwara qasa berhemanîna tirombêlan li Îranê di demekê de ye ku li gorî amara ku 10 Gelawêj ji aliyê Îdareya Gumrika Îranê ve hat bilavkirin, anînejora tirombêlan jî bi qasî %92 hatiye xwar.

Kompanyayên mezin ên cîhanî ên berhemanîna tirombêlan, piştî tundkirina hisarên ser rejîma Îranê ku ji aliyê Amerîka û Yekîtiya Ewropa ve, di Cozerdana sala derbazbûyî hat pesendkirin, pêwendiyên bazirganiyên xwe tevî Îranê qut kirin.

Li Cozerdana sala derbazbûyî di dirêjahiya hisarên Amerîka de, firotin û hinartina her cûre kel û pelên tirombêlçêkirinê bo Îranê qedexeyê kir.

AGIRI

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Tel: (+)9647503640792

Rêûresmên 25'ê Gelawêjê di binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ û di Nawenda 3'ê a Kurdistanê de



Nawenda 3'ê

kurdistanmedia



Nawenda 3'ê